

BARIYÊ BALA

KUDA HERIM...

Nesriyata dewleta Azerbaycanê

Bakû-1994 .

ББКС (күрд) 2

Б 25

Б 25

Rêdaktor: AHMEDÊ HEPO

Wenkeç: Firavan

Bariyê Bala. – Kuda herim...

Bariyê Bala nişkêva pê neavitiye edebiyatê. Ew êpêce riya dijwarra derbaz bûye, hê bûye xwedanê pirtûka ewlin. Eva pirtûka wiye dudane. Raste, êpêce sal ji weşandina pirtûka ewlin derbaz bûye, lê ewi tu wexta qelema xwe daneniye. Ew timê helbestara bûye hogirê şevê, royê, hogirê rê-dirba. Lema ji helbestê ve beravokê bi hewaskari, bi şîrinayi tê xwendinê. Goveka helbestê şair reng bi reng û fireye:

Hizkirina welêt, nerastiya qewmandinê emirda qewmî, hub-evintiya zelal, yek ji baweriya roja paşwextiyê.

Şaira hevtê qewmandina, mutalê xwe, kela dilê xwe bi hedewi biniyîne...

© Azernesç.

Б 4702350200 115 143-92
M-651 (07)-93

ББКС (күрд)

WETENHÎZÎ

KURDISTAN

Him sêfil bûm, him kasil bûm boy huba te.
Bûme kizîk, her gav helyam ez seba te.
Por sipî bu, ser zimine tim navê te.
Roj bihata, min bîdita azaya te...

Dîl westiya, pîr bedhalim, dûrim jî te.
Dermanên minî gerek binî tenê jî te.
Tu Zyretî, ez koçekim, koçekê te.
Heta kingê, ezê nebim mêvanê te...

Hogirên baş, bikewgîrî, hûn jî tev min.
Ava şêlû, mîsken danî nav çavên min.
Weten, xwezîl hemêz kîra her qulçên te.
Kutîa bûna rojên mine xeme bêy te...

Çavêd min rê, hesret kêşim, feqet dûrî.
Boy tew kurdan, emîr, jîne, gul û nûrî.
Wedê bîmîrî, bila domam bililînin.
Xwelîya te, ser tîrba min bireşînin...

AGRİ

Agri, kani, zımanê mın, him Xaniê zefi kebir,
Heta kinge, para kurd be, zindanên sar,

qeyd û zincir.

Axır çıma, talan dıkin, tew medenên mine zengin,
Hivi dıkım, cawê bide, tu şiheda tim ewılın?

Agri, ewıl, dılê daykam çıma kırım gelo çar ker
Ew tim bû dil, jêra anin bı hezara xem û keder.
Sebeb çiye, bıçûk bımırın, dayik û pir têkın lûvin,
Bıkêlme, bıhurmiye, tu şiheda tim ewılın?

Agri, zûda, talgê kurda tamam dunê bû beyane,
Kurd bextreşın, bê rusqeti timê bûye para wane.
Felek mera nadûmine, em girtine nıfrên zemin,
Xwina kurdan bu çem-kani, axır çıma naki girin?

Agri, bêje, ev qılêri kê derxist û kire lecê,
Sipana sar, zulfê direj, wexta dıkır weris Xecê,
Ereb hebûn, Asûr hebûn, him kurd hebûn,
him Kurdistan,

Dujminê me, xwinmêjê me mera gotın
"Tirkên çıyan"...

Agri, berê, hê gedimi, bapirada ma meselek,
Bê qurbana qet ne bûne ne azayi, ne zeferek.
Qurna bista xilaz dibe, paşda naçe çerxa zemin.
Zulma giran derbaz dibe, têne rojê eşqe-rengin...

DUNIYA, TU ÇIQAS ŞİRİNİ.

Mêrg û çiman, deşt û zozan eger bîbîn oymaxa mîn,
Xasbaxçê ter, gesrê fire tamam bîbîn mîskenên mîn,
Emir bîkîm hezar salî, tîme bîjim bî dîlê şa,
Ji resmê te ez têr nabim, tu şîrînî hergav Dunya.

Zor Îskender, Guhderz, Rostem hemû bêne
temenna mîn,
Mem tev Zine, Xec tev Eysê mêvan bêne meclîsa mîn,
Erşê bîlînd kursî daynim, wîra bîkîm kêf û şaya,
Ji huba te ez têr nabim, tu jî minra dêyi, Dunya,

Fegî bî eşg jî gorîstî tenbûra xwe boy mîn bine,
Mezîn Xanî çend zîmana şîrîn-şîrîn bigaline,
Xêni insîn, gulix bîkîn her kê pêş mîn mesyê bera,
Dayîna te ez têr nabim, bûka rewşî her tîm, Dunya,

Bî kulûra şêr û şenbaz cî bûne nav paxîla te,
Hemû binber cem te yekî, tu jî wanra dêyi, Dunya,
Ez jî ruhber, ewladê te, jî mîn neke tu gazîna,
Ka kî cvdî, god îdî bes, hemêza te zû çû, Dunya?

EWLED

Bera kûre, çemê gure, kana zengin,
Dara reze, alik tele, alik şirin.
Tacê zêre, fexra dunê gula bine,
Fesla nûhe geh bahare, geh havine.

Tem û leme, taqet-rewşa dê-bavane,
Hım kubari, hım ronayia herd çevane.
Tawet-sebre, xemıl-debre emrê şaye,
Per û baske, qam-qeweta mil-çokaye.

Şewa bêxew, kêra tûje, derdê giran,
Mereza dıl, bera kûre, ağır, tofan,
Gêdûka sar, tavya hare, êşa dıran,
Edû nevse, tevda jere, nabi xudan.

Xeber biçûk, lê boy zana gellek baha,
Êşa ewled pirre ji êşa hemû eza.
Si salyêda mın undakır yek ewledek,
Por sipi bû, dilêm qetya zu tamarek.

Bavım, hemû bava dıkım hivi, reca,
Sulhê hızkın, neyê dengê top û gulla,
Bıla ewled qet neminin bê bav, bê dê,
Ezman negri, xwin hılne de rûyê erdê..:

DUNYA

Tiji dîbi, vala dîbi, tîm bê qîrar,
Geh dîkeni, geh dîgriy, tu bê itbar.
Xezîna kûri, pêş te çîne ber, okêan,
Hemêza te tew cinete, em lê mêvan.
Gellek dinan xwastî ji te bîstinî bac.
Feget, ew man him bê sîtar, him bê ilac.
Lawê teme ne agîrîm, ne jî tofan,
Ne pîrîskîm, ne şîpûkîm, ne ba, baran,
Te xulqandîm, neda minda rusqet, zîman,
Navê m bû kurd, him bû m sêfil,
hîm bû m dêran,
Reca dîkîm îcar were tû mî n remê,
Destûr bîde, ez jî derê m keder, zulmê.
Belkî şabîn bîçûk, mezî n, qelbê n wêran,
Neyar kor bî n, aza bîbe tew Kurdistan.

ÇAWA NEGIRÎM

Pîsmamê qenc, dîl kulmeke,
Kedera wî weke dînya,
Hesreta mî n Kurdistane,
Dîj mî n kîrîye çar keriya.

Dotê cîndî, bûkê nazîk,
Bavê cahal, daykê rîndîk,

Xortê bı eşq, zarê sıvık,
Qırbûn, qırbûn, jê man hındık.

Bajarê geş, kanê zengin,
Gundê mezin, koşkê rengin,
Tew şewitin, tew hedimin,
Ça ne girim, nekım axın?...

Çemên zelal, him berên kûr,
Erş û kursi, ezmanê dûr.
Eger hıldın gışk derdên mın.
Wê belabın bê sero-bın.

HİNBE, LAWÖ

Bı derewa, gewle vala,
Nabi xwyê mal û hala.
Bıxbite ça palewan,
Bıbe tacê dê û bavan.
Nebe dilê nevs û tırsê.
Ne hebine çek û hepsê,
Emır rêke raste, xare,
Bende jêre, him lı jore.
Jiyin şere, lawê delal,
Alım-şêre evdê kemal.
Derbaz neke roja vala,
Bıgre qedrê pir û kala.

Dest emel be, meriv hezbe.
Dil temizbe, bê qerezbe.
Ulm bere, nebe nezan,
Weten hizke bi ruh û can.
Ziyareta te-heqiqet,
Her gav diji, namre senet,
Hinbe, hinke, tu lawo, can,
Milet, weten, neke poşman...

TEBİYETÊ DIKIM HÎVÎ

Sibê zûye dîlê bengi disa dîke pîrr ah û zar,
Lî kenarê Arxaşanê mîn girtiye mîsken, qîrar,
Mêzê dîkîm mêrg-çîmana, pîrr sorgulên gerdên zêrin,
Avên zelal dîmîlmîlîn, ser çemada dîkîn xuşîn.
Singê çîya hemêz kirye pîrr tirajêd germe, alav.
Ewir çûne dêm-sîfeta paqîş dîke baki zîrav.
Sosîn-rihan bî levze xwe disa dîkîn zef qal û ceng.
Warkozada ketîne rêzê reskêruvî, gezegezîk, kereng
Dotê kurda qelfe-qelfe ser kaniya bûne mêvan,
Revşa wane fino-qotîk, bîsk û tûncîk, torê mîrcan,
Şîvan şewat banê bîlînd "belo lû-lû" dîlîline,
Berxvan eşqa bêrîvanê bî dîl û can dîkakîne,
Deştê fire ketîne lecê gelle syarê gence-çeleng,
Pîr û kala xwekîrîne pîrr libasê tere-qeşeng.
Xort tev keça dîreqîsîn, îro şane dêmen evîn,
Kewa bedew qîbe-qîbe bîn zînara danyê hêlin.

Teyrê simir bask vekirye lî ezmanê çiki aza,
Bilbîl eşqe, nav golada tê qirina werdek, gaza,
Dengê defê, sewta zurnê hingavtiye geli, xubar,
Zozanên me ziyaretin, em tew dijîn wir bextewar.
Tebiyetê dîkîm hîvî kulme ava Arxaşanê,
Tevî Decle, Ferat bike bigerîne Kurdistanê.
Ça tîverîk bireşîne ser mexberê tev bêmraza,
Bêje kurdan ev şandiye jî mîskanê dew û doza.

ZIMANÊ MIN

Hemû qurna nav êgîrda tu pijyayî,
Heçiqiyî, herîşiyî, him helyayî,
Yasax bûyî, pêpez bûyî, ne helyayî,
Ne rîzyayî, lal ne bûyî, zîmanê min.

Beyaniya, meriv kuja tu veçîrin,
Ser te bîngêr tîm gerandîn tu hîncîrin,
Qels ne buyî, bend ne buyî, te kîr hurmin,
Tu palyayî, tu meyyayî, zîmanê min.

Bî te kenyan, tu lomandîn, ne tîrsyayî,
Dîlop, dîlop bûyî gorav tîm kîşyayî,
Neyar xwast te bîmîçqîne tu kelyayî,
Ne maşiyayî, ne weşiyayî, zîmanê min.

Te xemiland gışk Bisûtûn dinya zane,
Te xulugand kal "Avêsta" ev eyane.
Jı xaçgera te xelazkır din-imanê,
Hûrxwaş bûyi, rıcım bûyi, zımanê mın.

Fegi liland, Xani galand, Barzan qirya,
Goran lûvand, Şêxmûs hêrs bû, Hejar galya,
Xain mırın te naz dıke iro dinya,
Nûr-nederi, tu namiri, zımanê mın.

Qam qınyati, şûr-mertali, cida helal,
Bage guli, te hılçınıye ava zelal,
Qema tuji te qulkırıye dılê dıjmin,
Tew zımana şirintiri, zımanê mın.

Tu Sorani, tu Gorani, hım Kurmanci,
Ziyarêti, qulba mını, hım ji taci,
Geh sırini, geh engali, geh ji baci,
Xezna kûri, lel û duri, zımanê mın.

HEJARRA

Seyda Hejar, ax kesera nekışine tu hure-hur,
Dunya bere, em kelıkvan, boy me kurda delave kûr.
Ba aliki nake lilin, eva hukmê tım zemine,
Gıra kesi naşuxule, heta gava xût paşine...

Em çi bıkın, qet tebiyet rûyê kurda nekeniya,
Dayika me, lawo lûvand, şeva, roja ew giriya.
Dijminê me, xwinmêjê me, hîdûd lî me kîrîn wêran,
Tîmê xastîn yasax bıkın ew xebera nav-Kurdîstan.

Dîl kevîra şewîrandîn, hedîmandîn koşk û bajar,
Bok û beran xenîqandîn, pîr û kala kîr zare-zar,
Ka xezna me, kuda bîrîn, kîjan qulçî kîrîn cî-war,
Du tîreti me bû bela, muftexura keda me xar...

Dunya fire mera anî him bextreşî, him jî agir.
Dîroka me dijmin veşart, qurne, qurne nekîr zahîr.
Talan kîrîn deşt û zozan, mîskenên me bûn
zaxên sar,
Xwîna kurdan bû çem-kanî ser Decleda tîm
hate xar ...

Seyda, emrê zulmu giran îdî gellek nakîşîne,
Hegîgetê xîrav-qelpa agrê xweda bişewtîne.
Qurna bîsta kuta dîbe, Kurdîstanê bîbe aza,
Werê, tev mîn, gula dayne, ser maxberê şer-şenbaza...

VALA MAYÊ EW GUNDÊ ME
(Bona gundê me Semekaşê)

Tê bîra mîn ewa rasta xêlek mezîn.
jorê, şaxê fire, pîrr terazun.

Bintarêda zer û zînar gelekî kûr.
Wir ci bû bû gundê meyi ji xema dûr.

Şivana pez diherkandîn her sîbe zû,
Berxvana eşq dîkakandîn dîdane dû,
Destê cotkar edîlî bû ser maca cot,
Emîr şîrîn, tev şa dîbûn tew keç û xorî.

Tim êvara ser gund dîgirt dûkî zîrav,
Kuşîkada timê hebû kozi, alav,
Keç û bûkan şîv dadanî sîvre tîjî,
Temam zara zû-zû dîgirt lî dorê çî...

Kevanîyan tîjî dîkîr pîrr elbên şîr,
Kulînadî ci nedîbûn rûn û penîr,
Bî ereba dîkîşandîn debîr û nan.
Meriv dî bûn wê xebatê hîşmet, heyran.

Bestê meye hîme rast bûn, him jî berwar.
Rê-xozanî quloz dîbûn toz û xubar.
Temaşe bû wexta dîhat tevîk baran,
Keskesorê dîxemîland mêrg û çîman.

Dema dîhat wedê xwedî her tîm bahar,
Gundê mera derbaz dîbû bakî ne sar.
Awê himgê hîşyar dîbûn sosîn, rîhan.
Bîna gûla dîdî ber xwe deşt û zozan...

Şewlê kûrda berjêr dibûn zef avêd sar.
Kew-bîlbîla dora gula dîkîr hewar,
Tavê dîda, dîxemîlin best û beyar,
Gund cîned bû, gel dîjiya wir bextewar...

Rojeke xweş ber bajêra kîşîyan cahal,
Tu keseki pêşî negirt, mane ahîl.
Wê gavêda hal giran bû, wi gundê me,
Niha bê kes, vala maye ew gundê me...

XEWNÊDA

Îşev disa min xewnêda seyran dîkîr Kurdistanê,
Hali sêfil rasti min hat keça kurde teke-tenê
Ça qayde bû min sîlav da, ewê vegirt, sîlav kurdi,
Dewsa eşqê min vê carê peş çavên xwe zor ecêb di.
Baqê gula destê wêda diêwirî ber guristan,
Bîna xwinê gula dîhat, dîkewgîrî ewir-esman,
Rewşe hezîni, çave hêşîr, bîsk û tûnçîk bibûn xîrav,
Bijang-burîye bê kil-kîlcîk, cîlmîsî bû dêmê alav.
Fîno-qotîk ne lî sêrî, rêş kezi wê komkîribun,
Kîskê dêrmin mîlê wêda, çek-sîlahê herbê lêbûn,
Beden lî min bû telte geş, xûdanekê ser min dani,
Dîl tevzî da, qelb şewîti, cîvyan, ser min
deşt û banî.

Mil-çokada qudûm nema ez lerizim ewe demê.
Dumya pêş min bû hebsa sar, dilêm kete

keder-xemê.

Beden hejya, zıman zêrya, lêva kîrîn gazi-hewar,
-Ka koşk-sera, xasbaxçê ter, kê hedimand,

kê da qîrar?

Ka def-zurne, zılamêd geş, çit û perde, êla kurdan,
Emîr iro wa naxûaze, kine bî derd mîna kurdan,
Dîroka te pîrr qedîme, kulê dîlan kûr zêdene,
Dicle, Ferat, Mosûl, Kirkuk, ew kubari rewşa tene.
Dayka te da Şêxmûs, Qazî, him Berzanê

dunê meşûr,

Şêr Sulhedîn Erebaşan tew aza kîr bî zora şûr,
Feqî, Xanî, tacên zêrin, birê tene Hejar, Goran
Gelo çima Meşriqa kal hişt Kurdistan bibe wêran?..

XWEZIL

Xwezîl bîhelîn tîfîng, jî topa derneyê deng,
Rabîn sûrê hîdûda, erş û kursî nebin ceng,
Teyara têkîn avto, gemya derxîn bîn bera,
Kotana çêkîn hergav, gel jî sungî, xencera.
Aza bîkîn ordiya, bîla şênbîn deşt, zozan,
Wekî nebin bajar-gund idî xeza û wêran.
Polîgona hîlşînîn, fire bîbîn beyar, best,
Disa pîrbîn dibistan, biçûk hinbîn tew serbest.
Xwezîl mêvanên min bîn, Ereb, Hûnan û Hîndî.

Kurdîstana min şênbe, lêxe "Tenzera Cîndî".
Bîbîn pîsmamên hevdu, îspan, cîhûd, çîn, hebeş
Qawa mîskîn hazîrke, boy nefa xwe zengê reş,
Mexrîb û heta Meşrîq, hemu bîjîn bê xof, tîrs,
Bîla her cî azabe, sorgul hilde Tîrk, Farîs.
Jî heqîê derneên, Alman, Cîhûd, Înglis,
Mîj-dûman bê hîldanê ser welatê Patîris.
Gîşk hewra benda lêxin, bîgrîn pêşya çemên har.
Xwezîl, îdî bomên jerê dunê nekîn tar û mar...

EZ EW KESIM

Ewa kesê balgî kevîr,
Lîhêfa ser tenê ewîr,
Doşka bîni tîm erdê sar,
Surê, sermê beden lê xar,
Zaxe kîre koşka xemîl.
Tîfîngê xar tîmê namîl,
Ez ew kesîm, deng û besîm,
Şîrê helal mêtî kesîm...
Ew egîtê hogîr baran,
Berf daqurçand tîm dewsa nan,
Qet têr nedit xewa şîrîn,
Tevî gura kîre zûkîn,
Êwir dani ban-xubara,
Bû mêvanê zer-zînara,

Ez ew kesim, deng û besim,
Şirê helal mêtî kesim...
Ez Kardûxım, bavê Rostem.
Para min bûn kulûra xem,
Avêstaye zımanê min,
Bisitûne şabûna min.
Tacê zêrin Xani, Goran,
Feqi ani "Şêxê Senan".
Ez ew kesim, deng û besim,
Şirê helal mêtî kesim...
Mûsıl, Kırkûk, gelyê Zilan,
Bera Wanê, Qers, Qaqızman,
Dehok, Zexok, parek İran,
Sipana sar, deşta Berzan,
Hemu milk û warên minin,
Niha ah û zarên min,
Ez ew kesim, deng û besim,
Şirê helal mêtî kesim...
Niftam diçe tır çemên gur,
Axa mine tew lel û dur,
Ez kargerım, birçi ezım,
Qersê sarda miri ezım,
Dil birini pır kul-derdim,
Destûr tune welêt berdim,
Ez ew kesim, deng û besim,
Şirê helal mêtî kesim...

LI DIBISTÎN

(Qewmandîn diçe li Kurdistanê.)

Pencê royê quloz kîr bû ji her alî mîsk û gulav,
Sorgul-rihan tev şa dîbûn, dîmilmîlin germ û alav,
Rexşar bîlbîl, dengê kewê, xemil dabûn gulîstana,
Dergevana vekiribûn dişa dergê dîbîstana.
Dêr-sîfeta nûr dîbarîn lawa dîkîr karê hubê,
Pîr dayîka ewledê xwe ber dîbîstîna dîkîrîn rê.
Rûken ji hat, dîlî pejmûr, axîna kîşand li ber dêrî,
Hemû tîştî ecnebi bû, pîr jûjîn bû porê serî.
Zengîl lêda, zarok kom bûn, dersdar dişa hîrya,
kenya,

Xêni kurdi, anî ortê çend zîmanê ecnebiya.

Şîrovekîr kê him kîrye eşr û kursî, ava kewser,
Temam zarok temene bûn pêş ayeta

“Allah-ekber”,

Bî awazê telî-sîrîn, wî got gellek beyt û şêr,
Mîrûzî tel, çeve dûman, ne got nîavê Feqî, Herîr,
Ewê demê dengêkî zîz tîrê topê hîngavî xanî,
Ew Rûken bû, şêr dîgot ji “Nûbara” Ahmed Xanî.
Wî heqîqet kîr eşkera, xofgîr ne bû ji tu kesan,
Pîrsa ewlîna tenê bû ew, çî gotîne kurd-Kurdîstan?..
Vê pîrsa tel tîrê gullê agir kîre dîlê dersdar,
Ber çavê wî bû mîj-dûman, li dîbîstîna kîre hewar,
Cîvîyan temam qazî-zabî, dişa danîna şêwîr-tegbîr.

-Axır çima ewanê çiya biwekîlinin Xani, Herir,
 Heta kingê mîlkê meda quloz bibe nav Kurdistan,
 Çi lazîme boy maqûla û Şerqa kal eva zîman?
 Îro şunda kê got kurdîm, lî wi jêkin zar û zîman
 Wê rojêda Rûken avit lewzê başqe û dîbîstan,
 Heta iro "Nûbar" mîlda ew digere çol-çolîstan!..

ÇEMÊ FERAD

Tu mîn sîhke, bîsekîne, bîlûvine, meke xuşîn,
 Reca dîkîm were tev mîn basûd bîke hespê zemin,
 Çargav bajo dunya fire, deşt-zozana derê geştê,
 Kurdistanî mine rewşê, libasê nûh lî wê xweş tê...

Çemê Ferad, bûka teze reşxemîlî gelo çîma,
 Bav şehîd ket, dayîk bîrîn, lorîk bîrçî hîvya kêma?
 Gund û bajar kîrîn wêran, ser zînara xwîna
mîn ma,
 Hemû kurdan, Kurdistanê aza bîke em bîbne şa.

Çemê Ferad, qurne-qurne tev te kîşyan
hêsrên kurdan,
 Mene çiye dayîka mîn xîlaz nabe kul û derdan?
 Îdî bese, bîkêlme, lî alemê bîke hewar,
 Belkî îcar qencê dunê hemû kurdan bîkîn sîtar...

ANARÊ MIN

Hespê zemin zû siyar be, kar û barbe,
Rast mêzeke, him mêrxas û xunedarbe.
Tu bîbine berên mezın, him çemên kûr,
Merivhez be, qewmandına nemine dûr,
Bîhebine axa welêt, sosînên ter,
Rasti bêje, nebe dilê tu ziv û zêr.
Emîr delke, hene gavên tele û qeş.
Bîji, boy war, çi terane xemîl û rewş,
Kemala te nefê bîde dunya kebir,
Lawo, kurdi, Kurdistanê neke jî bir.
Tîm pîspor be, hergav naske xîrav, qenca
Tîrseka dûr, pêpes bîke xîrav, qelsa.
Bîhebine erş û kursi, tew mîleta,
Dayîkhîzbe, bîgre qedrê keç-hermeta.
Pardilêmin, tu nebîni xem-kedera.
Xîzmethîzbe, bîxemline qulç û dera.
Ez kubar bîm, pêş alemê, cem hevala,
Egîr-şêrbe cî bîgire nav hevala...

GAZÎYA MIN

Gelî bîra, deme, rabîn,
Hûn bî kemal xunedar bîn,

Rojên çûyi nekîn jî bir,
 Bihurmujin, bîbîn kebir.
 Dujmîn gure, ew nabe berx,
 Fîrsend timê bî xof û cerx.
 Ewîl waye hukmê dunê,
 Hîlqetînîn rehê zulmê,
 Zûda heye yek meselek:
 -Hevdû kevîn eger du sek,
 Şuxul diçe ça dixwazi.
 Rêwî dibe gelek razî,
 Tew kîhêlan hûn siyar bîn,
 Dewsa yekî pîr hezar bîn,
 Bîla negrîn keçên kezi,
 Pîr bîçûkên rûte, tezi.
 Zulmê derxîn kal û pîra,
 Bîqedînîn qeyd-zîncîra
 Tîm gotîye kal û bava:
 -War ronaya her du çava,
 Hemû mîlet tew bîrane,
 Kevîr cîda tîm gîrane...
 -Rabîn, gelî, beran-boka.
 Dujmîn bîxîn hûn ser çoka,
 Bîhedmînîn zîndanên sar,
 Welêt bîkîn timê bahar.
 Bîla şa bîn, lawen delal,
 Xwîn nekîşîn avên zelal,

Govend bigrın ahıl û genc,
Xırab herın bımının qenc.
Her qulc bibe bax, barıstan,
Ez ji lı we bıbım mêvan.

DİLÊ DÊ

Tım dıkeli noli ava germe zelal,
Tu reş dıbi, dıxıtımı, ça ewren lal,
Zû şa dıbi, fırnaq dıbi, tev rast-helal,
Tenê ji min gelek dûri, tu, dılê dê...

Kûr-mezını, xwastınê te tım bê hûde.
Tu bê qami, bê delavi, hım bê qayde,
Dılûvini, dı galini, kêra fayde,
Geh tariyi, geh ji nûri, tu, dılê dê...

Geh dıbi şêr, geh xezali, geh ji piling,
Hım gezgezki, hım rihani, hım ji gereng,
Geh egiti, ser sinora mılde tıfing,
Çemê guri, bera kûri, tu, dılê dê...

Bin û sebre, qınyat-emre, tera ewled,
Hım loxmani, şêwırdari, hım ji hedad,
Şewq-şemali, nûr-kemali, dıdi heyat,
Kan-xezneyi, gul-sosını, tu, dılê dê...

İDİ BESE

Ewrên tari, ne hurmîjin, ne gurujin, idi bese,
Gul-sosîna ne rencînîn, ne zêrinîn, idi bese,
Tavi, teyrok, nekîn gîrmin, nekîn ringin,
derbazbîn zû,
Kurdîstane birindare, ne êşînîn, idi bese.

Bayê samê hêdi, hêdi, neke gazi, hewar, dengi,
Dotê kurdan undakîrne bî hezaran xortên bengi,
Decle, Ferat, bîkewgîrîn, bîlûvînîn hezar rengi,
Kurdîstane şînêdaye, pejmûr nekîn, idi bese.

Berfa sîpi, zef nebare, ne ke tofan, pîr hewîrze,
Kurdên mîne bê sîtarîn disa neyne xemê teze,
Bomên jerê, hîvî dîkîm nav Helebçê peya nebîn,
Kurdîstana mîn cînete, ne şewtînîn, idi bese.

Tangê gîran, teyarê xof, nekîn gurîn, hîm teqe-req,
Bahar hatye, gul vebûne, hûn nerêjîn xwîna
neheq,

Gur Seğdamê îcar hîşk be, wê eyan be kiye neheq,
Kurdîstana mîn egite, feqîr nekîn, idi bese.

EZ KURDIM

Xatûn Qazê mêjandîme,
Werdê zû-zû hejandîme,
Fatê time ez şûştîme,
Sûtê gel ez veşûştîme.
Sisê şirin maçkîrîme,
Kewê hêdi ec kîrîme,
Qaso mêrga gerandîme,
Naso ez pîr hejandîme.
Şêxmûs Egit ez hinkîrîm,
Hejar mînra şîret kîrîn.
Got:-TU kurdî, qet bir neke,
Peş dijîmîna xwe mêl meke.
Tu Hejarbe, tu Şêxmûsbe,
Zef xîreti, pîr namûsbe.
Bigre qedrê heqîqetê.
Nebe dilê mal-dewletê.
Ulim hinbe, bîbe zane,
Veke sêrê pîr gîrane.
Fîrqi neke nav mîleta,
Bîhebine erf, edeta.
Nebê ezîm pîling û şêr,
Vê dunêda tek ezîm mêr.
-Dewran rûyê mî nekeniya, ~
Dakam helya, dakam zêrya.

Dujmın gotem, bê zımani,
Ne meriyê van erdani,
Hişmetkar bûm vê ecêbê.
Teng hat mınra tamam dunê.
Hebûn pêş mın bû taristan,
Lı mın hejyan dev û dıran.
Mın got:-Kurdım, eslê mın xas,
Dakam dane egit, mêrxas.
Kubarım bı Feqi, Xani,
Guhderz, Rostem himêm dani,
Bok-beranın, Qazi, Berzan,
Kan-xezneye tew Kurdistan.
Ruh û qelbê mın wetene.
Mırın, jınam tev wetene.
Dujmın bese, isaf bıke,
Rojên şırin mın tel neke,
Bese, bese, tena mınxi,
İdi nadım, kadam bûxi...

WETEN

Hım dınalım, hım dızêrım, dûri Weten,
Dıl hejarım, tengezarım, nûri, Weten,
Tırs û xofi, sırûk pême, tune bawer,
Jan gıranım, tu melhema mını, Weten...

Xerib warım, hêlin sarım, kurdım, Weten,
Hesretkêşım, te nabinım, derım, Weten,
Zelûlxemım, xali nabın çav ji hêşra,
Stüna dılı, bext-mirazê mını, Weten...

Per û baski, xemıl-rewşı, tımê, weten,
Qudûm-qami, şewq û şami, mınra, weten,
Bêy te idi ez bedhalım nema tawat,
Ziyareti, tıverıki, boy mın, Weten...

DUNYA

Alik şine, alik şai,
Alik tari, yek ronayi,
Alik baye, alik baran,
Alik berfe, alik tofan,
Alik baxe sosın navda.
Alik şere qetıl têda.
Alik koşkın, bircên belek,
Alik çerxe, alik felek,
Alik dızê têye dunê,
Alik diçe ber mırınê.
Hinek têr-têr direqısın,
Hinek zû-zû dıçılmısın,
Waye hukmê tebiyetê,
İnsan dilê heqiqetê.

Timê waye eva dunya.
Zindi dıçın riya mırıya,
Emrê çûyi venagere,
Bext ku raza jê vegere,
Ewled nes bû, dû bıgere,
Jın xırab bû bernegere,
Xwin rêjara nebın perde,
Bê welati kul û derde,
Kê ku heye aqıl-kemal,
Dibe xwedan dewlet û mal,
Kê ku tune hiş-feraset,
Timê dibe ew elawet.
Geh batile, geh qatile,
Geh zahıre, geh cahıle,
Sêr xezneye, tevda dunya.

EZ ŞANABIM

Hezar bahar bân, hezar carî vebın gul,
Hezar çem rabın, kani têkın xule xul,
Hezar best şınbın, bixemılın geli, del,
Hezar neçar bân, destêm nakın kar-emel,
Hezar rınd werên, tev mın bıkın gılı-naz,
Hezar saz lêdın, sazêm nayê tu awaz,
Hezar sêfil-jar gazın nekın ji zemin,
Hezar xerib bân dılêm nake qet iskin.

Hezar maşoq-yar mınra bının mızgin-caw,
 Hezar tımtêşi bireqısın bedew-kaw,
 Hezar dengbêj bên, bınıcrının pırr dengi,
 Hezar reng hebın, ez hılınadım tu rengi,
 -Heta daykam Kurdistan nebe aza,
 Heta kur û keç şa nebın ber mıraza,
 Heta pêşmerge derneyên ji zaxên sar,
 Heta dê û bav boy xwe nekın qazanc-kar,
 Heta kal û pir rihet nebın ser wara,
 Heta Şıvan ziz neqire gund, bajara,
 Heta hûr-pıçûk ne cıvın lı dıbısdın,
 Heta "Nûbaram" bılind nebe wek Îasin,
 Heta edlayi nebe para her yek kurd,
 Heta hebûnam nasnekın tew dın û xurt,
 Heta weletêda ez ne-çınım feki-rez,
 Heta boy weten çawê nedım tenê ez.
 Heta ala mın nemılmıle nav hewê,
 Heta hûdûdêm elam nebın tew dunê.
 Heta heykelê Feqi, Xani daneynım,
 Heta heyfa xweji sek Saddam nestınım,
 Heta rastnebın tew. planên faşe xar,
 Heta ji gedûka berjêr nebın dê û zar,
 Heta "Zor" dıjmin neqılın peş Qazi,
 Heta hemû kurd nebın emrê xwe razi,
 Heta dot û bûk derneyên ji zulm-qetlê.
 Weki şabıbım, helal nabe mın şırê dê!

XWEZIL

Xwezil rokê bîhaniyana mînra mîzgin,
Bıgotana:-Aza bûye Kurdîstana teye rengin,
Dê û dota êxistine cîlê şînê,
Melle nadîn idi terqîn û yasinê.

Neyarê hur teyaxnekîr revî paşda,
Zindanê sar, qersê tarî neman wîrda.
Ax seqîrî, red bû hejar, belengazî,
Eslman vebû, xemîline bestê tezi.

Dîreqîsîn pirê sed sal, keça heznî,
Dengê Şîvîn hîngavîye çîya-banî,
Sêfil-sexîr kom-kom dîçîn dîbîstana,
Kurd jî bûne xweyê dehok û diwana.

Kalê xîret, xortê cîndî, bavê lawhez,
Gund-bajara tev çêdîkîn bî xar û bez.
Destê cotkar disa çûye ser maça cot,
Xwîn vedreşîn kesê welat boy zîk fot.

Mîn bkîra eyda mezîn bî dîlê şa,
Mêvanê mîn bîhatana hemû qulba,
Evdê xêrxaz bîcîvyana holîka mîn,
Bînbîr, bîroz bîkîrana eyd roja mîn.

A hê minê bızanbûya ez merime,
Ezi bı reh, ezi bı war ne mırime,
Kesê bê ax dara pûce nagre bın erd,
Emrê şırin boy wi dıbe keser û derd.

BAHAR HATYE

Bahar hatye hemû binber dıkêlının bı lewzêd xwe,
Sosın-rıhan, dar û devi hêşin bûne ser rêhên xwe,
Berf dıhelın, çem dıkışın, dımılmılın ber hewzêr xwe,
Heta kingê ezê neçım tewaf nekım welatên xwe.

Bahar hatye, teyrık disa duguhazın ci-miskana,
Germ hêlina ew çêdıkın ber zınara, devê bana,
Warê teze çıqas başbe tema welêt nade wana,
Ew dızvırın, ez dımınım, xwezla xwe tinım wana.

Bahar hatye, ax dıkene binber dıkın xebad-kare,
Daykam disa ber çar riya sekıniye bendeware,
Sal buharin, dıl kaçık bû, hesreta mın weten-ware,
Xwezil xwedê Seddamê hur zû bışine tırba sare.

Bahar hatye, jı Helebçê qoloz dıbe bina jerê,
Qers-Qaqızman, Serdeşt-Zaxok disa bûne gola xwinê,
Pir dıgırın, kal dızêrın, hivja xortın bûkê perdê,
Zulma gıran nazıl bûye seva kurdan tenê erdê.

SEYDA REHİM, HELA ZÛYE!..

(Rewayi Rehim Qazi dıkım)

Seyda, rabe hela zûye, iro mırın lı te nayê,
Halê weten pırr gırane, dujmınê har nayê rayê,
Serê riya nav gedûka te zêrina daik-zara,
Dehok, Zexok şewıtine gunê halê kesûk-jara.
Rabe, rabe, ne wedeye, weki heri mezarê sar,
Kurdistanê bibe aza, emê çêkın, bajar û war,
Rabe, iro te dıxwaze parek İran, ruhê Qazi,
Kurdıstane hivya teye tevi ruhsin nebe razi.
Fırsend hatye, lezmekeve, hılqetine rehê qetlê,
Zû piroz kın pir û kala, tev paqışkın em hêsrê dê,
Roke gıran te da meda şertê mêra bı helali,
Tev me şerki, heta welêt em dernexın ji vi hali,
Gelo çima, wedê zûtır te birkırın sond û qırar,
Qelbê mezın, kurdê boy te timê bıkın pırr ah û zar.
Seyda, pêş te, ez sond duxwum xwastinê.

te bighinım ci,
Cesedê te bıbım welêt, daynım ciki lap bılınd ci...

AX FELEK!..

Ax felek, wax felek, bê itbar, felek,
En siyar, tu peya, te nagrım, felek,
Em hene, em dıjin, dızêrım, felek,
Carekê rûyê me bıkiene, felek.

Neyar hat, hebûn bır, şa bûyi felek,
Em kelyan, em nalyan, seqıriy, felek,
Zar maşyan, dê gıryan, ne hati, felek,
Carekê rûyê me bıkene, felek.

Kasıl bûn, rênciyan dûmeka, felek,
Afrikê zengê reş aza bûn, felek,
Netırse xemên me sıvıke, felek,
Carekê rûyê me bıkene, felek.

Tew milet, bûn xweyi, mal-rosqet, felek,
Erd yê me, em mane bê welat, felek,
Em dımrın, tu disa kıvş nabi, felek,
Carekê rûyê me bıkene, felek.

Miri çûn, em zındi hûrxwaş bûn, felek,
Tırbên me bın tanga pêpez bûn, felek,
Kanên me neyara kışandın, felek,
Carekê rûyê me bıkene, felek.

Mergên me, deştên me, bedêwîn, felek,
Mal ya me, em têda fîrarin, felek,
Avên me dîkîşîn, em tîne, felek,
Carekê rûyê me bîkene, felek.

Me Rostem da, Sulhedin da, ıngîriy, felek
Me Feqî da, me Xanî da, xerîqî, felek,
Em bînîsin, em çîlmîsin, nehati, felek,
Carekê rûyê me bîkene, felek.

Helebçe tew bû jer, geş bûyi, felek,
Çûk helyan, pîr nelyan, te xwaş hat, felek, •
Mêr mîrîn, keç zêryan, tu ku bûyi, felek,
Carekê rûyê me bîkene, felek.

Qasım hat, Seddem hat, doş bûyi, felek,
Kemal hat, Cemal hat, geş bûyi, felek,
Teyara em kuştîn, te fez da felek,
Carekê rûyê me bîkene, felek.

Pîrr tîfal, ser berfa qerîsin, felek,
Hêleçan vala man, te xaş hat, felek,
Xortê qenc, dotê baş pîrr qîr bûn, felek,
Carekê rûyê me bîkene, felek.

Şewlê kûr, gelyê dûr, betûlin, felek,
Çemê gur, ser meda mîçîqîn, felek,

Bextê me tim reş bû, tu kuyi, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Xwedê em dergên xwe avitîn, felek,
Ser erdê em rehet qet nebûn, felek,
Birin me axivin, tu kewke, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

Em kurdîn, qels nabîn, bir meke, felek,
Pêş dujmîn, ber zulmê narevin, felek,
Yan mîrîn, yan Weten, dewe eve, felek,
Carekê rûyê me bikene, felek.

EM EZ KÎME?

86121118
Ne xwin rêjim, ne pîrr bêjim, ne ji dêran,
Ne du rûme, ne xainim, ne ji filan,
Ne rê birim, ne ked xurim berê-berda,
Xuluqime, xali nabim kul û derda.

88
Ez ne dîzim, ne qaçaxim, ne derew bêj,
Nerevekîm, ne din-harim, ne ker û gêj,
Ez kargerim, xwudan rêjim berê-berda,
12011118 Ez hirome, ez girome nav emîrda.

Ne feqîrîm, ne bedeslîm, ne bê tîvdir,
Ne acîzîm, ne kasîlîm, ne bê tegbir,
Welat hîzîm, bok-beranîm berê-berda,
Simêl palîm, tîrsam tune zincîr-qeyda.

Ne kevîrîm, ne gedûkîm, ne korta xar,
Ne kanîme, ne gelîme, ne çemê har,
Gula binîm, bê av mame berê-berda,
Bê rûsqetîm, tengezarîm Şerqa kalda.

Ez Musîlîm, şên Kirkûkîm, Cızîra rweş,
Mehabatîm, Erdehanîm, Serdeştîa rewş,
Gul Sînekîm, geş Bîdlîsîm, Sîpanê rînd,
Ez Batmanîm, ez Pîlûrîm, hezara gund.

Dîyarbekîr, Dêrsîm, Hîzan, hîm jî Zexok,
Ez Decleme, ez Feradîm, hîm jî Dehok,
Deştîa Wanê, gelyê Zîla, cot Agrîme,
Kosedaxîm, Eleđaxîm, zar cîndîme.

Ûrfa, Sêrîm, mêr Şîrnaxîm, hîm jî Mêrdîn,
Gur Erezîm, Hekarîme, Mûrada dîn,
Rewandûzîm, Ûrmiya kûrîm berê-berda,
Ser bîlîndîm, zûda xasîm eslê xweda.

Ez Bisûtûn, "Kevrê sondê", Helebçême,
Erfîna rez, "Çîyayê bêxêr", lawê çême,
Erzurumum, Qaqîzmanîm berê-berda,
Ez ne kenîyam, ez şa nebûm vê dînêda.

Ez Guhderzîm, Rostem Zalîm, şêr Sulhedîn,
Ez Qazîme, ez Barzanîm bîkîn yeqîn,

Şêx Schidım, Ocalanım berê-berda,
Xêni welêt tewat nakım ez tu erda.

Ez Feqime, ez Xanime, hım Cıziri,
Cegerxwinım, sert Bateme, kal Heriri,
Tac Goranım, mêr Hejarım berê-berda,
Bextê mın reş, dişewıtım nav êgırda.

Sıyabendım, Xecazerım, dılêm wêran,
Sitya alım, Zina jarım, Memim, heyran,
Bengi Eysım, pırr namüsım berê-berda,
Dılovanım, bê hucetım ruhê xweva.

Leyla Qasım, Zekiya şewat, rınd Bınevşım,
Eşışanım, Gulistanım, awaz xwaşım,
Fedaima, Pêşmergema berê-berda,
Bê sûc-gune tım dızêrım hêpsê sarda.

Ez ne tırkım, ne erebım, ne ji fariz,
Ne Qazaxım, ne Êzbêkım, ne ji Qırqız,
Midya kalım, Şedadime berê-berda,
Bê zımanım, bê miskanım mala xweda.

Riya mın heq, eslê mın kurd, musulmanım,
Kanê mın pırr, axa mın dur, lê mêvanım,
Ez bırçime, ez tezime berê-berda.
Kalyam, nalyam, ez perıtım xeribyêda.

MESÛD BARZANÎRA

Lawê Barzan, bîhurmûje, bîkelîje noli şêra,
Tu ewlede Kardûkani mêr dîkevîn tîm jî mêra.
Dînya fire têke hewar, rîcîm bîke nevsî dijmin,
Neseqîre, ne betîle, bîqedîne xwastînên xwen,
Bîbe leheng, zerpa lêxe, ser neyara têke tofan.
Rusqet xastîn etîb nîne şîna derxe daykê dêran,
Îdî bese dotê kurda ser mexbera bîkîn lûvîn,
Qurna bîsta kuta dîbe, hukûm daye zûda zemîn.
Heta kingê zîmanê me assax bîbe dîbîstana,
Beyanîyê welêt hîldîn, emê bîjîn gorîstana.
Bîkêlîme Cîzir, Sîpan bîxemîlîn hezar rengî,
Textê Seddam welgerîne, zaxa derxe xortê bengî,
Bext-talqê tew kurdanî, nede xwînîrêj, fîrsend,
imkan,
Heyfa şêra tu bîstîne, bîla şabîn kurd, Kurdistan,
Ez jî şabîm, tera bînîm baqe gulê sore teze,
Welatê xwe tewaf bîkîn, qebra Xanî bîkîm mêze!..

NADIR, BIRÊ MIN!

(Rewayî 60-salîya Akadêmîkê kurdayî
ezîz Nadîrê Kerem dîkîm)

Dêda bûyî wedê dunya nerehet bû,
Kevin çûbû, nuh edla xwe ne girtî bû,

Çarhewardor qurin, qujin, mırın û cerd,
 Şer dıkenya, xêr dızêrya pır bûbûn derd.
 Em bûn hêsir, ketın beri, çolıstana,
 Gelek tıfal bırçı delyan ber bıstana,
 Emır boy me bû pêberjêr em tım hol bên,
 Hınek mırın, hınek helyan, hınek qal bên.
 Pêpez mekır şırê sıpi te got kurdım,
 Daykam karê, bavêm kerem, wan ça birkım.
 Şev û roja ne seqıriy xwıdan tım rê
 Kemala te rewşa xwe da ulmê welêt,
 Serê kurda te bılınd kır weke Sipan,
 Kurd natırsın, kurd şer dıkın bı ruh û can.
 Emır hene heyştê, nod, sal gelleki jor,
 Emır hene rojeke wan şeweqa zor.
 Sterka şewqi, şemal dıdı qulç û dera,
 Lokê ulmı sıpi diki rûyê kurda,
 Lema iro ser bılındı, hım bextewar,
 Wek Xaniyi kurd bı terra dıbın kubar.
 -Xwezıl iro Şvan vır bûya Gulıstan rex,
 Govend kurdi bıreqısyay, bıkıra cerx.
 Enya heca maçkırana Celal, Barzan,
 Eyd sala te piroz kıra şêr Ocelan.
 Xwezıl ciki em bıçûna Kurdistanê,
 Pê-parê te nûr têkıra çolıstanê,
 Çavê hêsir, dılê bırın baqe kulilk,
 Te daniya ser mexberê dûre û nêzik.
 Tewafkıra ax kevırê şêr-şenbaza,
 Sed car nele bıda neyar kurd nexaza.

Bı desti xwe melhem danya ser bîrina,
Icar bıbra boxçê-barê ken-mîzgîna.
-Ziz bıgota, kezav Seddam idi bese bıki şer, qal.
Pır mekuje gır û hûra ne hedîmine disa koşk, mal.
Ne zêrine pır û kala, daykê ser reş, zeri-dota.
Malık xırab, kurd mêrxasın, nıkari wan bini çoka.

YA XWEDANÊ, BÊ XUDANA!..

Erş û kursi te xulugand nav kîr dinya,
Ruhber rabûn te kîsi xwe para wan da.
Hinek geryan, hinek fıryan, pak şıqîti,
Hinek hur bûn fetisandın heqîqeti.
Parek lez ket, zû-zû çêkr jer û alav.
Parek rûnişt lı hev ani delk û dolav.
Hinekara te da rusqet, bextewari,
Me kurdara te timê şand tel hejari.
Hinek şa bûn xemilandın koşk û sera,
Hinek revyan, tım qerîsin serê riya,
Parekê ax timê kola, kotnê karger,
Parek geryan nava ciya ew bûn rêncber.
Gotin, -wê bê ew xudanê bê xudana,
Wê malhemke kul û derda, hım jî jana.
Tu nehati, em helandım, kemıtandın,
Kırın kızıq, rûn, donû me nuqumandın.
Ki bû xwinrêj te destê xwe pêşda wan da,
Te carekêva em birkırın nızam çıma?
Em bûn hêsir zêwrê birçi xwina me mêt,
Welat zêrya me neqedand merem û nêt,

Nıft me dcrxısd, neyar bûn toq, kêf wan ajot,
Ked-heda me wana kırı, wana firot.
Qersê sarda em kalkırın, em rızandın,
Wê wa bûya, te çıma em xuluqandın?!

DILO, LEZ NEKEVE, HELA ZÛYE!..

Riya te tım dırne, dırne, xaro-marro,
 kuç-pel bûne,
Hesreta te axa welêt, paxıla dê,
 kur-keç bûne,
Kani, orman, zer-zınarê welêt hela
 te nedine,
Bestê fire, zozanê berf, çemê fûr-fûr,
 te nedine.
Kendalê xar, xıncikê reş, şewlê
 bın av te nadine.
Mêrg û çıman, xasbaxçê ter, sorgulê
 bın te nedine.
Gıvic, tırşık, şılanê tem geliyê meda
 werixine,
Zeytûn, hêjir gıhiştine, were tev
 mın bicırpine.
Sêv, hınara, hurmê welêt temke têr-têr,
 bike nûbar,
Terazuna tu mêzeke ser êlêda em
 bêne xar.

Rınd bîbine bûkê xêli, zavê şermok,
keçê bıkır,
• Berbûyê naz, daykê kedhez, kal û pirê dîkın,
zıkır.
Kıla bîdın nehêra dar, vexwun tasek dewê
meşkê.
Bıkursinin kulora dê, bereketê mexın
teyştê.
Bıla şıvan boy te dîsa bilûra xwe
bıncırine.
Berxvan seba bêrivanê berbı zome
bîlezine,
Swar bın kîhêl, menekê çê, bajonn
çargav, bîbın mêrxas,
Axa welêt em hemêzkın, tew qulçara
em bîbın nas,
Reva neyar em bîbinın, maçkın eyna egit,
şera.
Helebça jer xema derxın, Seddam bekın
nıfır, çera.
Kulilkêd ter bıçırpinın pêşkêş
bîdın keç û zerya,
Kurdistanê têr bıgerın,
vexuın avên belekiya.
Cızira rewş bîbine mêvan, tewaf
bıkın ırba Xani,
Vekın derê dîbîstana, bıxemlinın
mal û xani.

Bıhecqının serê Seddam, bıhedıminın,
qersê tari,
Gund bajara, ava bıkın, welêt derê sew,
hejari,
Em bıbinın kurdê aza, xweyi rusqet, hım
wekilnevs,
Dinya, alam me pirozke, me nasbıkın,
neyar û qels,
A wê hingê ezê bêjım, dılo, deme,
ızın teye,
Ezi idi bextewarım, mırın icar
seva meye.

HUB Û NIZKIRIN

ŞABIBIN NE BAHAR TÊ

Çiya merga kire gazi,
Xewê rabûn darên tezi,
Kışyan avên pır tevızı,
Bilind fırya teyrê bazi,
Got, şa bıbın, ne bahar tê...

Hevdu şa bûn maşoq û yar,
Hate xanê gulberfa jar,
Rûbarada xezal bûn xar,
Quling qirya kire hewar,
Got, şa bıbın, ne bahar tê...

Hırça xewar derket lanê,
Gurik maşya ber zozanê,
Rûvi şa bû kır fêlbazi,
Kêwrişk revî, kîre gazi,
Got, şa bîbîn, ne bahar tê...

Bêbelizkê kır virtonik,
Keça şûştin derî, şêmik,
Kewê maçkîr zû-zû zînar,
Hêlin dani ser kevrê sar,
Got, şabîbîn, ne bahar tê...

Bîlûrvana lêxist bîlûr,
Ruhber şabûn kulûr-kulûr.
Esmanada niqîti nûr,
Bîlbîl kakya hate jî dûr,
Got, şabîbîn, ne bahar tê...

Mîn mêze kır dunya fire,
Xemîlî bû lel û dure,
Ba û baran ketbûn rêzê,
Keskesorê dabû fêzê,
Yaram şa bû, got, bahar tê...

Mîn xast şa bîm, dîl kewgîrî
Emrê cahal zû buhurî,
Tîmê zêryam nema taqet,
Dujmîn neda mînra rusqet,
Bahar ne bû mînra qîsmet...

BÊY TE BAHAR ÇI MINRANE

Rıhan mêrga bûne bengi,
Tev xemılın hezar rengi,
Bahar ku hat kırım dengi,
Bêy te bahar çi minrane.

Bıla vebın belgên dara,
Xemıl dayne best, beyara,
Xew şırınbın paxlê yara,
Bêy te bahar çi minrane.

Avên zelal bıkın guş-guş,
Govend bıgrın her qal û qırş,
Sosın gula bıkın paqış,
Bêy te bahar çi minrane.

Xezal û kar tev bımıkın,
Kewêd lingsor hêlin çêkın,
Hemû ruhber lebas xwekın,
Bêy te bahar çi minrane.

Disa şên bın pırr mılک û war,
Bıxemılın zer û zınar,
Hevdu şabın maşoq û yar,
Bêy te bahar çi minrane.

Quling daynın terazuna,
Keskesor bide ser zozana,
Xort gazikın zend bazına,
Bêy te bahar çi minrane.

Zivker disa çêkın kenber,
Jı dêma bân mîsk ü enper,
Keç bimeşın, him zo, him fer,
Bêy te bahar çi minrane.

Emîr ketye roja zalê,
Qamet eyîni resmê dalê,
Ez nexaşê hub, kemalê,
Bêy te bahar çi minrane.

Hivya teme her gav, her dem,
Barên mînin keder û xem,
Eger neki lî mîn kerem,
Bêy te bahar çi minrane.

BAHAR

Wedê xweda tu xêr hati,
Binberara anî şayî,
Deşt û zozan bûn germoge,
Te xemiland rez û baxe.

Emir dûrket zivîstanê,
Berfgul hate disa xanê,
Cetri, sirik şin bûn çiya,
Keçik meşyan ser kaniya.

Vebûn berroj, banê fire,
Xuşin kete avên gure.
Maşoq-yara kire gazi,
Kewê maçkır kevrê tezi.

Dumeqeskê çekır hêlin,
Quling dûrva kire qirin.
Lawık keça bûne mêvan,
Hevdu şabûn tew kal û can.

DÎLBERA MIN

Delala mın, ez bı gori, tu ne mûmîr, ne feneri,
Dılê temiz ez dîbêjim-qet ne avi, ne kewseri.
Tebiyetê xulîqandi, boy mın bûyi tu heqiqet,
Jı bîstanê Xatûn Zînê te mêtîye kemal, qewat.
Gelek rojên tele-şirin derbaz kîrîn me tevayî,
Emekê me behra xwe da, em bên xudan mal-avayî.
Te serê mın pîrr bîlînd kîr weke Agri, çiyayê Sipan,
Namûs, qîret, te zêde kîrt jı ronaya herdu çavan,
Em bûn bîrçi, himji tezi, te jı emir nekîr gazın,
Temam xastın me qedandın tev me şabûn
bîçûk-mezın,

Xêlê qenca, pîrr xîrava, jî min pîrsin gellek cara,
Min got: tenê du Dilberê bedew bûne lî van erda,
Yek Dilbera mine eşqe, bexteware, him jî aza,
Yeka dinê ew Dilbere, Feqi di bû xewna şeva.
Ez naxwazim rewşa zêde, çi mirane dewleta pîrr,
Emrê mine ewa huba teye geşe, hergave gur.
Te daye min du gulê bin, yek Eliye, ê dun Anar,
Ew nebinin gulê, barût, jî wan dûrbîn dijmîn, neyar.
Ez nîzanîm, ne eyane, emê bîjîn çiqas salî,
Tebiyetê dîkîm reca, tev min neçî qedra xalî.

SALA TEZE

Hat kalekî rûdan qerqaş,
Lîbasê wî etlêş, qumaş,
Got:-Navê min Zivîstane,
Ez mezînê çar bîrame,
Ku datînim, pê û pare,
Xwera tînim emrê sare,
Dîqersînim çem û kanya,
Qerqaş dîkîm deşt û banya,
Min hez dîkîn bax û bostan,
Vala dîkîm deşt û zozan,
Min nas bîkîn, gelî zara,
Kombîn hemu werên vîra,
Got:-Û meşya dora merxê,
Zarok dû wî ketîn çerxê,
-Tu baş hati, kalkê delal,

Bıde meda aqıl, kemal,
Sulhê bine, tamam dunê,
Em nebinın keder, xwinê,
Tew hudûda bıde hıldan,
Bıçûk hevdû bıbın mêvan,
Bıla şabın dayik, mezın,
Pirk, kalık, nekın gazın,
Te aniye kakıl, qendık,
Mewicêd zer, badam, fındıq,
Sêve sorık, sincên sıvık,
Hêjirên ter, hınar, tırşık,
Xurmên bexda, kunci, dendık,
Noqutê şor, kaxê rındık...
Hergav were, kalkê delal,
Mera bine hewa zelal,
Em nebinım tu mereze,
Me piroz be sala teze...

TE DIGERIM

Gav, sıhet û her dem,
Sal, heyam û pırr xem,
Roj, meh, tew zeman,
Te dıgerım, ez heyran...

Gul, sosın û rıhan,
Çiya, bani, him zozan,
Şhedın, ba û baran,
Te dıgerım, ez heyran...

Zer, zınar û orman,
Kevt, kani û çıman,
Şehedin, mij û dûman,
Te dıgerım, ez heyran...

Lı bal keçan û kuran,
Nava çelan û kortan,
Serê riyan û dırbın,
Te dıgerım, ez heyran...

KEÇA KURD

Tu lel, duri,
Agrê guri,
Gerden gazi,
Sedef sazi,
Timê boy mın...

Xec û Zini,
Eys xatûni,
Hêjir, merxi,
Xezal, berxi,
Timê boy mın...

Sûret sori,
Xeyset hori,
Dêm alavi,
Tew gulavi,
Timê boy mın...

Hinar, sêvi,
Ro û hivi,
Nevat lêvi,
Şirin devi,
Timê boy min...

LAWÊ MIN

Lawê mini delalo,
Hilde kitêb-kemalo,
Sibê wedê dersa te,
Dê ü bav kefila te.

Lawê mini ezizo,
Dêm zelali, sewt zizo,
Bixwin, hinbe, lawo can,
Dê, bavê neke poşman.

Lawê mini giştiko,
Hilde kitêb, kisko,
Bilez, bigij hevalan,
Ji wan nemin tucaran.

DOMAMA KURD

Domama kurd, dilê mînda hinberê te tunene.
Tu sosîna xasbaxçani, bêy te bahar tunene.
Tebiyetê ji xezîna xwe pîrr letafet, daye te,
Dilê teda min dilîra qet merhemet tunene.

Dêmê nazîk-nevsa minra pêşkêş ani keder-xem,
Bûme bengî, çî karene pêş huba min ber û çem
Gelo çîma min direvî, min dûr dîçî tu herdem,
Ruh û canî, axir bêy te sebîr boy min tunenc...

Recadarim, qet nebe tu, nav emîrda carekê,
Bî dilê qenc pêşkêş bine gel jî minra gulekê,
Weki roja dl-xatîra ez nenalim pîrr xedar,
Bî eşq û şa ewîr bigîrîm ser şemîka qebra sar.

KEÇA KURDA

Ez jî tera av nabêjim,
Tu jî avê zelaltîrî,
Ez jî tera gul nabêjim,
Tu jî gulê zef bintîrî.

Tu ne kewa nukul nexşî,
Weki bême nêçîra te,
Ne xezala baxçê rewşî,
Tîm bigîrîm pey rêça te.

Keça kurdi bê fit, reca,
Sêva sori hati hucra.
Haveynê te nûra temiz,
Dûrîn jî te tew rêc û iz.

Burya kılke tirê her car,
Gulya şeke tim bine xar,
Ez ramûsim dêmê alav,
Tu bedewi bê mîsk, gulav.

BILBIL

Dıgalini, dılûvini, mın dıhelın dıl û ceger,
Pırr wedeye nazık yarê mınra nayên caw û xeber.
Bahar ji hat, deştê vala, darên tezi girtin rewşê.
Kewa bedew dor zınara qıbe-qıbe lewzi xwaşe.

Bılбіlê rınd, mîskanê te xasbaxçê ter, pırr gulên al,
Qısmetê mın huba erzan, bı hezara xem û xeyal,
Emır dıçe, por sıpi bû, dılê bengi qet naweste,
Xwezî icar seva yarê bîfiriya ez ji tev te...

Bılбіl, idi, tu azayi ez hejarım, hım tengezar,
Qamet xar bû, qudûm nema, dıl ji hubê ne bû bêzar,
Ezi bengi, ew bê insaf, param ne bû huba helal,
İdi bese, tu ji tev mın, timê biki wa gala-gal...

Tu dızêri, ezi zûda birindarım, hım ji bengi,
Ezi kerım, tu nawesti, li alemê diki dengi,
Beden helya, çav şêlû bûn, derbaz dıbin pırroj û sal,
Bêje yarê, ser tırba mın bıla bıke tim nale-nal...

TE HIZDIKIM, KEÇA DELAL

Tu ne Şami, ez ne Perwar,
Bişewtim ber agirê te,
Tu ne guli, ez ne gulvan,
Fîtil bîdîm ez dora te.

Tu ne zeri, ez ne zînar,
Rewşa bîdîm hebûna te,
Tu ne sêvi, ne jî hînar,
Bax-bostana bîgerîm te...

Tu dayîkî pîrr emekdar,
Egîr-şêrî, hîm xunedar,
Alîm, loxman, dunê zanî,
Şair, dengbêj, palewanî.

Te hîzdîkîm keça delal,
Sîlava min şîrîn vegre,
Çevê belek bê kîl rîndîn,
Dêmê bedew pêş min negre...

Ez mêzekîm xal û xeta,
Tu nazîkî, gerdan berfîn,
Dîlê bengî bîla şabe,
Jî eşqa te têke iskîn...

HUBA ME

Mın û te,
Ser kaniyê
Bin dara merxê,
Disa hevdu di.
Dar hışyar bû,
Gulte, gulte,
Ser meda dax 1st si,
Ji huba me,
Şelên bûzê,
Ew dem heliyan,
Avên zelal kîrîn hewar,
Bîlbîl şabûn terazuna,
Pîrr xemîlin best û beyar.
Sorgul rabûn ketîn rêzê,
Qaz-qulinga xwe dan fêzê,
Xezal mêrga bûne bengî,
Kewa kakand hezar rengî,
Şewqê dani tarstana,
Karger deket bax-bostana,
Şîvin kerî disa berda,
Lî berxvana kîre qîrîrn,
Leglekê baskê xwe lêda,
Çem û kaniya kîrîn xûşîn,
Me helalî,

Da hevduda,
Qewl, qırar,
Huba mera xasti şabûn,
Pejmûrda bûn edu-neyar.
Sebeb çibû, kijan qelsi,
Tu ji hubê kiri bêzar?
Ez bûm bengi, tu bê itbar,
Dilê mında te tım dani,
Agireki guri, xedar...

BAHARA Bİ REWŞ HATİYE

Şıvan derket ser baniya,
Hat kalina berx û miya,
Wirqin kete kaw-cındiya,
Bûxuşina çem-kaniya,
Bahara bı rewş hatiye.

Dumeqeskê mızgin ani,
Leglegê zû hêlin dani,
Quling qiriyan, erşê esmin,
Teva rabûn xewa şırin,
Bahara bı rewş hatiye.

Bışkok girtın çıqlê dara,
Tavê dani ser beyara,
Kulilka vekır lı çiya,
Tebiyet şa bû keniya,
Bahara bı rewş hatiye...

HEY BÊ ÎTBAR!...

Mın tu diti, xemêm bûne kulûr û kan,
Dıl rıcfı, çok lerızın, hejya zıman,
Beden sıet bû, cev şêlû bûn, şıdyan dıran,
Xeberê ter, awırê sar seba çine?

Zar sırini, dıl keviri, tım bê itbar,
Hub fıroşi, bê wefayi, hım jı xedar,
Bêjê çıma, te bir kırın qewıl-qırar,
Gunekari, ef û xastın seba çıye?

Mın tu diti, xast bıkevım ken-heneka,
Disa herım ser kaniya, nav kulılka,
Maçkım lêva, pozê xızêm û şırıka,
Guhastına çavê belek seba çıne?

ÇARRÊZ

Eger qewas bıçerçıre,
Durê derê bınê berê,
Weki gul zû ne çılmıse,
Bılıl nake xem-kederê.

Zıvistanê ci guhazki nabe bahar,
Jer hasilbe jê dernayê gulav tu car,

Bedeslara hemêza xwe biki sîtar,
Kutasiyê jê nabini bext û itbar.

Bixebite nav emirda bibe gîran,
Pêş bedewa tu car nebe dil û deran,
Bapirê me şîret kirne hê qedimi,
Rîndî sêve, alik qespe, alik kurmi.

Qet bir neke tu şîretê tew bapira,
Gur berxve ji wira nebe tu car bîra,
Hesin mîlke, weki germbe nav êgîrda,
Xeyd, tîm heye nav xeisetê jîna bîda.

SATIRA

QIJIK BÛ MÊRXAS

Sîbe zû bû, sîba rengin,
Teyir, tûya, dîkir wîtin,
Xew rabûbûn hemû kûvî,
Ser sorgula hebû avî,
Çem-kaniya dîgalandîn,
Dar-deviya dîlilandîn,
Mijê da bû qotê çiya,
Rêwî hebûn serê riya,
Kelba yek-yek dîkir ewtin,
Gurê xedar çû bû têlin,

Hırça gıran ketbû lanê,
Ruvî çûbû ser tolanê,
Resık, sirık zû ba dıbûn,
Gezgesk, gereng tev şa dıbûn,
Şivin dıkır hekin, hokin,
Berxvan nava xewa şirin,
Vi heyamê geşi, rındık,
Hate xanê “mêrxas” qıjık,
Fırî, dani banê bılind,
Got: “Dunêda tek ezım rınd,
Çıkarene, leglek, quling,
Qazê pinti, kewê xarling,
Bılbılê vır, teyrê simır,
Xezalê din, kevotkê hur,
Çem û kani tew yên minın,
Koşk û sera mılkên minın,
Pêş min bıbın hûn temenne,
Bona minın kan û xezne,
Fıtla dunê desti mine,
Fermana min efû tune”.
Bı hêrs gerya kın û dirêj,
Mirûzi tel, dıl da qırêj,
Ne fıkırî, ne kır tegbir,
Esıl, isas derxist ji bir,
Çek zû hıl da meşiya çerdê,
Gemar hıl da tenê erdê.

Teşk lerızın, nukul xar bû,
Bask rûçikin, dev lê sar bû.
Doçik weşya, çav bınısın.
Dil û hınay lê qerısın,
Wê nas nekır bıçûk, mezin,
Pûrtevebû, nav agrên xwen...

IDARA MEDA

Pismamê qenc, her roj cem me tim civate,
Xema meke ev hel boy me bû edete.
Dikelijın, dihurmişın piling û ner,
Dihedimın, teze dıbin, kevn û ter,
Elam dıbin, zef pılanên bıçûk, mezin,
Gışk xebathez, çetınaya nakın gazın.
Zû hel dıbin hemû pirsê sıvık, gıran,
Nexebiti bê şerm, bê xof dıbin beran,
“Fem-feraset” derbaz dıbe disa cıvat,
Ser kaxeta tê kıvşkırın hemû xebat.
Em şa dıbin, fırnaq dıbin, ewê demê,
Dılı pırr şa, berbı malê dıkevne rê,
Sibê disa tê weklandın eva qayde,
Teze tune, kevin idi nade feyde.
Jı kevıra derdkeve tim nan me,
Van, cıvata kê xılazke ruh, nebsa me?

MIŞKÊ PIRR XWE RAZÎ

Rokê mişkê pîrr xwe razi,
Gerya koşka, bestê tezi,
Pozê xwe kîr hemû qulça,
Leqya, loqya, noli hırça,
Hêrs bû, rîk bû tebiyetê:
-Ne xulqandim jî-qudretê,
Çira lazîm ewqas binber,
Çîma çekîr bendê, beşer,
Minê dunê bineqşanda,
Bere çema bîzvîranda.
Lel-dur hîlda binê bera.
Xemîl bîda hemû dera,
Têlmaş meşya ber zozana,
Tînaz kîrîn mêrg-çîmana,
Kîre nîrîn wek "fil-dêwa",
Şêr û şepal kîne vîra.
Fîkîr neda qaz-werdeka.
Qîrya, qurya ser leglega.
-Wî pîrr hûr kîr, gîr û gîran,
Kîre şîngîn çawa beran.
-Pîlîng gerek pêş mîn dîl bîn,
Gur û rûvî zîman lal bîn,
Dest mîn daye çerxa zemîn,
Ezîm xwyê erş û ezîmîn.
Erd hîndîq bû bîn piyê wîda,
Cî nedîbû çermê xweda
Xast hîkîşe zer û zanga
Wur bîqîre ter qulînga,

Pışo hêdi kire mewin,
Hafat hejya kire çivîn,
Revi, revî mina gullê,
Xwe avite pışta millê,
İdi wira nehat xanê,
Ne terbi rızma dunê...

ŞEV BÛ

Qafreş disa dor guharê dıçû, dıhat dıkir ewtin,
Gurê xeder xwe kevtêda veşarti bû dıkir axin,
Şeva tari xezal dıbû "hafat" mabû bê kar-cmel,
Qudûmî sist, zıki birçi, dıkewgiri ewa qertel.
Wi bawer kır, qafreş idi nabe wiya fit û bêri,
Zûkya, kûzya, bêkaqvi dıl, rabê dêrket ji wî wari,
Hejya, meşya, çû derkêt banê bılind, hafa gêli,
Wura zûkiya, got:-qafreş, tu birneke evi gılı:
-Esıl, cinsê min te yekın, bese bibi dujmin, neyar,
Boy insanê xav şir mêtî bese biki waqas hewar,
Destûr bide, em ji bîjin, xeza nebın ji vê dunê,
Bê me bende arxani bın, tuyê nêzda bibi finê.
Qafreş dûrva ew mêzekır, ziz ewtiya, kire gazi,
Got:-Xedaro, ez te zanım, idi ji min çi dıxazi?
Esıl-cinsê min te yek bûn, lê em zûda hev qetyane.
Te qelpi kır, bûyi xedar, ez hızkırıya tew meryame,
Destê bende min xariye ritıl, ritıl xo û nane,
Ez qenciya pêpez nakim, nabım dilê delk, fêlane.
Temam eve, aqıl rûnê, bese biki wê dew, dozê,
Pêşya gotye "Kesê aqıl naxıtmîne kanya dızê"...

NAVROK

WETENHEZİ

Kurdistan	3
Agri	4
Dunya, tu çiqas şirini	5
Ewled	6
Dunya	7
Çawa negirim	7
Hinbe lawo	8
Tebiyetê dikim hivi	9
Zimanê min	10
Hejarra	11
Vała maye ew gundê me	12
Xewnêda	14
Xwezıl	15
Ez ew kesim	16
Li dıbıstin	18
Çeme Ferad	19
Anarê min	20
Gaziya min	20
Dilê dê	22
Idi bese	23
Ez kurdım	24
Weten	25
Dunya	26
Ez şanabın	28
Xwezıl	29
Bahar hatiye	30
Seyda Rehım, hela zûye	31

Ax felek	32
Ez kime	34
Mesûd Barzanîra	37
Nadîr, birê min	37
Ya xudanê, bê xudana	39
Dîlo, lez nekeve, hela zûye	

HUB Û HIZKIRIN

Şabîn ne bahar tê	42
Bêy te bahar çi minrane	44
Bahar	45
Dilbera min	46
Sala teze	47
Te dîgerim	48
Keça kurd	49
Lawê min	50
Domama kurd	50
Keça kurda	51
Bîlbîl	52
Te hîzdîkîm, keça delal	53
Huba me	54
Bahara bî rewş hatiye	55
Hey bê îtbar	56
Çarrez	56

SATÎRA

Qîjîk bû mêrxas	57
Idara meda	59
Mîşkê pîrr xwe razî	60
Şev bû	61

БАРИЈЕ БАЛА
НАРА КЕДИМ...
(күрд дилиндө)

Бәдии редактору: Т. Мәликов
Техники редактору: С. Шаһбазова
Корректору: Симзәра Мәһмуд

ИБ № 5677

Жығылмаға верилмиш: 10. 10. 93
Чапа имзаланмыш: 20. 04. 94
Офсет үсулу илә. Әдәби гарнитур
Форматы 60 x 90 1/32. Мәтбәә кағызы 2
Шәрти чап вәрәги 2,0. Шәрти рәнкли сурәти 2,19
Учот нәшр вәрәги 2,0. Сифариш № 39
Тиражы: 1500
Мүгавилә гијмәти илә

Азәрбајчан Республикасы Мәтбуат вә Информасија
Назирлијинин Азәрбајчан Дөвләт Нәшријаты, Бақы
370005, Нүсү Начыјев күчәси, № 4

3 №-ли Бақы китаб мәтбәәси, Бақы, Әли Тағызаде
күчәси, № 4

PDF:

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

Tel.:

+7 918 073 48 79

